
# SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com Hejmar: 04 Dîrok: Adar 2022 DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ


# EM BI SER KETIN

# انتصرنا







Adar li dijî zilma zilamperest meha serhildana jinan e. Adar li dijî Dehaqên zalim pêxistina agirê raperînê ye. Adar meha li Qamişlo û Halepçe bi awayekî hov qetilkirina gelê Kurd e. Adar meha ku Nûnerê MLKP Rojava fermandar rêheval Baran Serhed hat şehîdkirin e.
Di meha Adarê de wê gelê me û Tevgera Komûnîst bi hev re di van kêliyên dîrokî de bigihêjin hev. Wê hêrs û raperînên xwe li dijî pergalên zalim, mêtînger, kapîtalîst û emperyalîst li qadan nîşan bidin. Ji bo pirskirina hesabê şehîdan wê hişmendî û çalakiyên xwe yên komûnîst mezin bikin. Wê bibin jinên azad, bibin Kawa, bibin Baran Serhed û ji bo Kurdistan û Rojhilata Navîn şer bikin. Ji bo şerên hîna mezintir wê bawerî, hêvî û vîn ava bikin. Em ji Tevgera Komûnîst a Şoreşger re ku bi vê armancê wê kar û xebata xwe bide meşandin serkeftinê dixwazin.

مارس هو شهر انتفاضة النساء ضد القمع الأبوي. مارس هو بداية انتفاضة نارية ضد الطغاة. آذار هو شهر المجازر الوحشية للشعب الكردي في القامشلي وحلبجة. آذار / مارس هو الشهر الذي اغتيل فيه ممثل تنظيم الحزب ، القائد باران سرحد. في آذار مارس ، سيجتمع شعبنا والحركة الشيوعية في هذه اللحظات التاريخية. سوف تظهر غضبها وثوراتها ضد الأنظمة الاستبدادية والديكتاتورية والرأسمالية والإمبريالية في الميدان. إن التشكيك في روايات الشهداء من شأنه أن يزيد وعيهم وأفعالهم الشيوعية. سوف يصبحن نساء حرات ، ويصبحن كاوا ، ويصبحن باران سرحد ويقاتلن من أجل كردستان والشرق الأوسط. ستبني الإيمان والأمل والإرادة لحروب أعظم. نتمنى للحركة الشيوعية التوفيق في القيام بعملها لهذا الغرض.


2 ROJEV: Em bi ser ketin

6 JÎN: Ji bo azadiya xwe li hemberî zilamperestiyê şer bike!

4 BÎRDOZÎ: Fêmkirin û Redkirina Kapîtalîzme

8 ÇIRÛSK: Pêşengê Komunîst ê Şoreşa Rojava Nemir e

# EM BI SER KETIN

Welatê me, Rêveberiya me ya Xweser a Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî hîna di ev mehên yekemîn ên sala nû de bi êrîşên piralî û berfireh ve rû bi rû ma. Siyaseta PDK'ê ya embargoyê, hevkariya xwe ya bi dewleta Tirk re, bomberanên Tirkiyê û êrîşên dagirkeriyê, astengiyên ku Rejîma Sûrî ji bo Rêveberiya Xweser nas neke derdixe, rolên DYA (Emerîka), Rûsya û Koalîsyonê di van êrîşan de, xebatên ku ji bo Rojava negîhîje statûya fermî bênavber berdewam in.

Pêwîst e êrîşa DAIŞ a li ser hepsa Hesekê ya Xiwêran di vê berfirehiyê de were dest girtin. Bêguman DAIŞ'ê êrîşeke wiha berfireh tenê li dar nexist. Di nav pîlansaziyê de destpêkê de dewleta Tirk a dagirker û rejîma Sûrî, Rûsya, DYA (Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê) û hêzên koalîsyonê hene. Dema DAIŞ'ê êrîş anî ser hepsa Sînaa, Dewleta Tirk jî êrîşên hemwext li ser welat, gel û kadroyên pêşeng lidar xist. Ev geşadanî ji me re dide xuyakirin ku wê sala 2022'an çi qasî dijwar derbas bibe. Tê fêhmkirin ku hêzên kapîtalîst, emperyalîst, faşîst û dagirker li dijî pergala me ya Rêveberiya Xweser wê ji bo DAIŞ'ê qadên hîna zêdetir vekin. DAIŞ'ê bi êrîşa hepsa Xiwêran hedef kir ku serçeteyan (emîr) birevîne, hinek ji qadên welatê me têxe bin kontrola xwe û tevlîheviyên hundirîn derxîne. Lê berxwedan û berêrîşa QSD'ê, gelê me û hemû saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser pîlanên DAIŞ'ê vala hatin derxistin. Gelê me DAIŞ'ê nas dike. Artêşa me berê ev çete ji axên me paqij kirin. Lê ew hêzên hevkar, mêtînger, emperyalîst û kûrewî ku me li jor behsa wan kir polîtiqayên xwe yên li dijî welatê me vê carê xwestin bi rêya DAIŞ'ê pêk bînin. Dîsa bin ketin. Me polîtîqayên dijminên xwe di êrîşa li ser hepsa Sînaa de vala derxist. Me bi artêş û gelê xwe ve berxwedaneke mezin nîşan da. Me ev serkeftin bi saya sekna fedayî ya şehîd û gaziyên xwe bi dest xist. Em bi ser ketin.

### Em Xweparastinê Xurt Bikin

Careke din hat dîtin ku dijmin vala nasekine. Hat fêmkirin ku li ser axên me, di nav gelê me de veşartî dixebitin û rêxistin dibin. Ev di heman demê de di hinek xalan de kêmasiya asta rêxistinbûn û xweparastina gelê me jî nîşan dide. Divê em rastiya ku DAIŞ li Hesekê hîna dîtina cihê ku têde bimîne, girtina piştgiriyê wek pirsgirêk bibînin. Nexwe gelê me û saziyên Rêveberiya Xweser li dijî van çeteyan têra xwe ne şiyar in. Ev jî li dijî dijmin kêmbûna hişmendî û rêxistinbûna gel û kesên ku di rêxistinên sazûmanî de kar didin meşandin dide nişandan. Em DAIŞ'ê ji pergala kapîtalîst û emperyalî serbixwe nikarin bifikirin alternatîfa (vebijark) kapîtalîzm û resmaliyetê komûnîzm e. Cekdarkirina gelê me bi hişmendî û rêxistineke komûnîst wê bibe xebata herî girîng a xweparastinê ya vê pêvajoyê.

Niha yek ji xala herî girîng a bilindkirina xweparastinê ew e ku gelê me ji dewletên kapîtalîst, emperyalîst, faşîst, netewparêz hêviya xwe qut bike û berê xwe bide xweparastinê. Gelê me divê li gel piştevaniya gelên cîhanê yên bindest hîna zêdetir bala xwe bidin welatê Rêveberiya Xweser. Ji bo jiyaneke azad û wekhev divê bi hişmendiyeke dijkapîtalîst, dijemperyalîst û dijmêtîngerî rêxistin bibe û têbikoşe. Bingeha ku DAIŞ, newekhevîtî, serdestiya zilamperest xwe li ser ava dike bingeha kapîtalîzmê ye. Têkoşîna li dijî DAIŞ, newekhevîtî, zialmaperestî û emperyaliyetê divê bi hişmendiyeke dijkapîtalîst û rêxistinî ve bi hev re bê meşandin.

Divê Tevgera Komûnîst bi vê hişmendiyê li her dere kar û xebata xwe bide meşandin. Hemû qadên ku em tê de ne, ango bajar, tax, dibistan, kargeh û malen me divê bibin wargehên rêxistinkirina têkoşîna li dijî DAIŞ, kapîtalîzm, emperyalizm û zilamperestiyê. Pêwîst e saziyên Rêveberiya Xweser, komîn, meclîs, artêşa gel û hemû saziyên şoreşê yên din bi vê hişmendiyê xebatên xwe ji nû ve rêxistin bikin. Xebateke xweparastinê ku bi hişmendiyeke wiha were rêxistinkirin wê hîna xurtir bibe.

Li Hesekê cereke din em bi ser ketin. Gelê me bi ser ket. Yekîtiya gelê Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Tirkmen, Çekes bi ser ket. Me careke din nîşanî dijminê xwe da ku gelekî rêxistinkirî bin nakeve. Em leheng û şehîdên xwe yên ku di vê serkeftin û berxwedanê de şehîd ketine careke din bi bîr tînin. Bi hêza ku me ji wan girtiye divê em di xweparastin û avakirina welat û Rêveberiya Xweser de hîna zêdetir berpirsiyartî bigirin ser milên xwe û xebatên xwe mezin bikin.

### Dewleta Sûrî û Rejîma Esad

Gelên ku li axên di bin rêveberiya rejîma Esad û dewleta Sûrî de jiyan dikin di nav xizantiyeke mezin de jiyana xwe berdewam dikin. Qismek ji axên Sûrî û Rojava di bin dagirkeriya Dewleta Tirk û çeteyên wê de ye. Li benda azadbûnê ne. Lê rejîma Esad nikare axên ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de ye rizgar bike. Rejîma Esad bi qasî ku bê piştgiriya Îran û Rûsyayê rojekê nikare li ser piyan bimîne bê vîn û bê hêz ketiye. Rejîma Esad bi vê rewşa xwe jî pergala me ya Rêveberiya Xweser hedef digire. Dibe şirîkê êrîşa DAIŞ'ê ya li ser hepsa Sînaa. Propagandaya şerê taybet dike. Hewl dide ku gelê me bixapîne.

Weke ku di pêvajoya êrîşa DAIŞ'ê ya li ser hepsa sîna de hatiye dîtin desthiladariya Esad li Sûrî yek ji astengiya girîng a li ber jiyana azad, wekhev û bi hev re jiyankirina gelan e. Tevgera komûnîst hem di parastin hem jî di avakirina Rêveberiya Xweser de wê li dijî poltîtîqayên desthiladariya kapîtalîst û mêtînger ên Esad têkoşîna xwe berdewam bike.

### Geşedanên li Ukraynî

Li ser Ukraynî amadekariyên dagirkeriyê yên Dewletên emperyalî û NATO'ya ku dijminê gelan e berdewam e. Dewletên emperyalî yên Ewropa û DYA'yê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) dixwazin Ukraynayê tevlî NATO'yê bikin û bi vî awayî bi temamî bixin bin kontrola xwe. Rûsya jî li dij vê polîtaqayê derdikeve. Rûsya dide xuyakirin ku ger Ukraynî tevlî NATO'yê bibe ev sedema şer e û ketina axên Ukraynî yanê dagirkirina Ukraynî bi awayekî zelal diyar dike. Qeyrana NATO û Rûsya li ser Ukraynî demeke dirêj e berdewam e.

Berpirsiyarên qeyrana Ukraynî polîtîqayên dagirker û mêtîngêriyê ku Emerîka û Rûsya dide meşandin in. Ev her du dewletên kûrewî yên emperyalîst li Rojhilata Navîn, Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî bi hebûnên xwe sedemên qeyran û şerên heyî, sedemên xizantî, mirin, koçbertî û pergalên zilamperest in. Divê gelê me bizanibe ku ev dewletên kûrewî yên emperyalîst diçin ku derê û li ku derê hene li wir şerên paşverû û dagirkeriyê hene.

Ger Qeyrana Ukraynî bizîvire şerekî mezîn, bêguman wê bandora vê li ser Rojhilata Navîn û pergala Rêveberiya Xweser bibe. Hêzên her du dewletên emperyalî yên wek Emerîka û Rûsyayê ku bingeha vê qeyranê ne li ser axên me hene. Li welatê me yê Rêveberiya Xweser û Rojhilata Navîn divê têkoşîna li dijî emperyaliyetê rojanetiya xwe biparêze.

### Meha Adarê

Adar li dijî zilma zilamperest meha serhildana jinan e. Adar li dijî Dehaqên zalim pêxistina agirê raperînê ye. Adar meha li Qamişlo û Halepçe bi awayekî hov qetilkirina gelê Kurd e.

Adar meha ku Nûnerê MLKP Rojava fermandar rêheval Baran Serhed hat şehîdkirin e.

Di meha Adarê de wê gelê me û Tevgera Komûnîst bi hev re di van kêliyên dîrokî de bigihêjin hev. Wê hêrs û raperînên xwe li dijî pergalên zalim, mêtînger, kapîtalîst û emperyalîst li qadan nîşan bidin. Ji bo pirskirina hesabê şehîdan wê hişmendî û çalakiyên xwe yên komûnîst mezin bikin. Wê bibin jinên azad, bibin Kawa, bibin Baran Serhed û ji bo Kurdistan û Rojhilata Navîn şer bikin. Ji bo şerên hîna mezintir wê bawerî, hêvî û vîn ava bikin. Em ji Tevgera Komûnîst a Şoreşger re ku bi vê armancê wê kar û xebata xwe bide meşandin serkeftinê dixwazin.

Li hepsa Sînaa ya Hesekê li hemberî DAŞÎŞ'ê careke din em bi ser ketin. Em ê feraseta ku DAIŞ afirandiye, hêzên kapîtalîst û emperyalîst ku piştgirî didin wê, dagirkeran, mêtîngeran, serdestiya zilam, bi bilindkirina rêxistinbûna xwe û hişmendiya sosyalist têk bibin.

# انتصرنا

لا تزال بلادنا ، إدارتنا الذاتية روج افا وشمال وشرق سوريا ، تواجه هجمات متعددة وواسعة النطاق في الأشهر الأولى من العام الجديد. سياسة الحصار التي ينتهجها حزب PDK ، وتعاونه مع الدولة التركية ، والقصف التركي وهجمات الاحتلال ، والعقبات التي لا يعترف بها النظام السوري للحكم الذاتي ، ودور الولايات المتحدة (الولايات المتحدة) وروسيا والتحالف في هذه الهجمات ، العمل الذي لا يحقق روج افا مكانة رسمية لا ينقطع.



في هذا السياق ، يجب وقف هجوم تنظيم الداعش على سجن حسكة في زويران. هجوم واسع الانتشار بالطبع لم يكتف داعش بالهجوم. تشمل الخطة في البداية الدولة التركية المحتلة والنظام السوري وروسيا والولايات المتحدة وقوات التحالف. وعندما هاجم تنظيم الداعش سجن الدولة التركية ، نفذ أيضاً هجمات متزامنة على الدولة والشعب والكوادر القيادية. يوضح لنا هذا التطور مدى صعوبة عام ٢٠٢٢ . من المفهوم أن قوى الرأسمالية والإمبريالية والفاشية والمحتلين ضد نظام الحكم الذاتي لدينا ستفتح المزيد من السبل لداعش.

وكان هدف داعش هو اختطاف الأمير من سجن خيير للسيطرة على بعض مناطق بلادنا وإنهاء الاضطرابات الداخلية. لكن مقاومة ومقاومة QSD وأبنائنا وجميع المؤسسات التابعة للإدارة الذاتية أحبطت مخططات داعش. شعبنا يعرف داعش. لقد طهر جيشنا بالفعل هذه العصابات من أراضينا. لكن تلك القوى المتحالفة والمتشددة والإمبريالية والعالمية التي ذكرناها أعلاه أرادت تنفيذ سياساتها ضد بلدنا هذه المرة من خلال داعش. سقطوا مرة أخرى. لقد كشفنا سياسات أعدائنا في الهجوم على سجن الخطيئة الفارغ. لقد قدمنا مقاومة كبيرة مع جيشنا وشعبنا. لقد حققنا هذا النجاح بفضل تضحيات شهدائنا وضحايانا. نحن فزنا.

**نحن نعزز الدفاع عن النفس**

مرة أخرى تبين أن العدو لا يعرف فارغة. كان مفهومنا أنه في أراضينا نعمل سرا وننظم بين شعبنا. كما يظهر في مرحلة ما عدم وجود مستوى التنظيم والدفاع عن النفس لشعبنا. يجب أن نرى حقيقة أن داعش في حسكة لا يزال يجد مكانًا للبقاء وإغلاق الدعم كمشكلة. نحن ، شعب ومؤسسات الإدارة الذاتية ، لسنا متيقظين بما فيه الكفاية ضد هذه العصابات. كما يظهر نقص الوعي والتنظيم لدى الأشخاص والأفراد العاملين في المنظمات المؤسسية ضد العدو. لا يمكننا التفكير في داعش كبديل للرأسمالية وشكلية الشيوعية ، مستقلة عن النظام الرأسمالي والإمبريالي. سيكون تسليح شعبنا بوعي وبتنظيم شيوعي أهم عمل للدفاع عن النفس في هذه العملية.

الآن واحدة من أهم النقاط في رفع مستوى الدفاع عن النفس هي أن يتخلى شعبنا عن الأمل في الدول الرأسمالية والإمبريالية والفاشية والقومية وأن يستسلم للدفاع عن النفس. يجب أن يولي شعبنا ، بدعم من الشعوب المضطهدة في العالم ، مزيدًا من الاهتمام لبلد الحكم الذاتي. يجب تنظيم حياة حرة ومتساوية ومحاربتها بعقلية معادية للرأسمالية ومعادية للإمبريالية ومعادية للسامية. الأساس الذي يبني عليه تنظيم داعش عدم المساواة ، هيمنته الأبوية ، هو أساس الرأسمالية. يجب خوض النضال ضد داعش وعدم المساواة والقمع والإمبريالية جن بًا إلى جنب مع الوعي المناهض للرأسمالية والوعي التنظيمي.

يجب أن تقوم الحركة الشيوعية بعملها في كل مكان مع أخذ ذلك في الاعتبار. يجب أن تصبح كل المناطق التي نعيش فيها ، أي مدننا وأحيائنا ومدارسنا ومكاتبنا ومنازلنا ، مخيمات لتنظيم النضال ضد داعش والرأسمالية والإمبريالية والعنصرية. من الضروري لمؤسسات الحكم الذاتي ، والكوميونات ، ، والجيش الشعبي ، وجميع المؤسسات الثورية الأخرى أن تعيد تنظيم عملها مع أخذ ذلك في الاعتبار. إن عمل الدفاع عن النفس الذي يتم تنظيمه بمثل هذه العقلية سيكون أقوى.

انتصار آخر في حسكة. ربح شعبنا. ساد اتحاد الشعوب الكردية والعربية والأرمينية والتركمان والتشيكية. أظهرنا




مرة أخرى لعدونا ألا يسقط منظمًا أكثر من اللازم. ونذكر مرة أخرى أبطالنا وشهدائنا الذين استشهدوا في هذا النصر والمقاومة. وبالقوة التي أخذناها منهم يجب علينا تحمل المزيد من المسؤولية في الدفاع عن النفس وبناء الدولة والحكم الذاتي وزيادة عملنا.

**الدولة السورية ونظام الأس د**

لا يزال الأشخاص الذين يعيشون في الأراضي الواقعة تحت حكم نظام الأسد والدولة السورية يعيشون في فقر مدقع. جزء من سوريا و روج افا تحت احتلال الدولة التركية وعصاباتها. في انتظار الإفراج. لكن نظام الأسد لا يستطيع إنقاذ الأراضي الواقعة تحت احتلال الدولة التركية وعصاباتها. لقد سقط نظام الأسد بلا حول ولا قوة من دون دعم إيران وروسيا إلى أن يستطيع يومًا ما أن يقف على قدميه. في هذه الحالة ، يستهدف نظام الأسد نظامنا للحكم الذاتي. ربما يكون حليف داعش في سجن صيناعة. متخصص في الدعاية الحربية. نحاول خداع شعبنا.

كما رأينا في سياق هجوم داعش على سجن صيناعة ، فإن حكم الأسد في سوريا هو أحد العقبات الرئيسية أمام حياة الحرية والمساواة والتعايش بين الشعوب.

ستستمر الحركة الشيوعية في محاربة الأنظمة الرأسمالية والديكتاتورية للأسد، من أجل الدفاع وإعادة الإعمار.

**التطورات في أوكراني**

الاستعدادات جارية لاحتلال أوكرانيا من قبل الدول الإمبريالية وحلف شمال الأطلسي ، عدو الشعب. تريد الدول الإمبريالية في أوروبا والولايات المتحدة )الولايات المتحدة( أن تنضم أوكرانيا إلى حلف شمال الأطلسي وبالتالي السيطرة الكاملة عليه. كما تعارض روسيا هذه السياسة. صرحت روسيا أنه إذا انضمت أوكرانيا إلى الناتو ، فسوف يؤدي ذلك إلى الحرب ، وأنها تحدد بوضوح غزو الأراضي الأوكرانية أو احتلال أوكرانيا. استمرت الأزمة بين الناتو وروسيا بشأن أوكرانيا منذ فترة طويلة. المسؤولون عن أزمة أوكرانيا هم سياسات الاحتلال والديكتاتورية التي تنتهجها الولايات المتحدة وروسيا. هاتان الدولتان الإمبرياليتان العميقتان في الشرق الأوسط ، وروج افا ، والشمال والشرق سوريا ، مع وجودهما ذاته ، هي أسباب الأزمات والحروب الحالية ، وأسباب الفقر والموت والهجرة والأنظمة القمعية. يحتاج شعبنا إلى معرفة إلى أين تتجه هذه الدول الإمبريالية العميقة وأين توجد حروب واحتلال متخلفة. إذا تحولت الأزمة الأوكرانية إلى حرب ، فسيكون لها حتماً تأثير على الشرق الأوسط ونظام الحكم الذاتي.

**١٨آذار ، مجزرتا القامشلي وحلبجة ، نوروز ، ٢٣ آذار ، ذكرى القائد باران سرحد**

مارس هو شهر انتفاضة النساء ضد القمع الأبوي. مارس هو بداية انتفاضة نارية ضد الطغاة. آذار هو شهر المجازر الوحشية للشعب الكردي في القامشلي وحلبجة. آذار / مارس هو الشهر الذي اغتيل فيه ممثل تنظيم الحزب ، القائد باران سرحد. في آذار مارس ، سيجتمع شعبنا والحركة الشيوعية في هذه اللحظات التاريخية. سوف تظهر غضبها وثوراتها ضد الأنظمة الاستبدادية والديكتاتورية والرأسمالية والإمبريالية في الميدان. إن التشكيك في روايات الشهداء من شأنه أن يزيد وعيهم وأفعالهم الشيوعية. سوف يصبحن نساء حرات ، ويصبحن كاوا ، ويصبحن باران سرحد ويقاتلن من أجل كردستان والشرق الأوسط. ستبني الإيمان والأمل والإرادة لحروب أعظم. نتمنى للحركة الشيوعية التوفيق في القيام بعملها لهذا الغرض.

لقد انتصرنا مرة أخرى على هجوم داعش على سجن صناعة سنهزم المفهوم الذي أوجده داعش ، القوى الرأسمالية والإمبريالية التي تدعمه ، المحتلين ، الديكتاتوريين ، الهيمنة الذكورية ، التنظيم نفسه من خلال رفع الوعي الاشتراكي.

# FÊMKIRIN Û REDKIRINA KAPÎTALÎZMÊ

Şoreşgerî redkirin û xwestin e. Ji bo ku mirov karibe rewşa camidî ya heyî red bike pêwîst e zanibe rexne bike. Di rexnekirinê de tişê ku giring e yek jê jî berdêla wê zanebûn û xwestin e. Mirovên şoreşger pêwîst e rewşa camidî ya heyî bi awayekî şênber binirxînin, milên erênî û neyênî derxînin holê. Piştre berdêla wê diyar bikin, bixwazin û ji bo wê têkoşîn bikin.
Di roja me ya îro de rexnekirin û hilweşandina kapîtalîzmê ji bo şoreşgeran esasek e. Şoreşger li gorî rexneyên xwe dikarin riyeke têkoşînê bidin ber xwe. Ev rê bi çi şêweyê bibin jî heta ku sosyalîzmê nekin armanca xwe ya esasî nikarin rêberiya şoreşeke civakî bikin. Îro ji bo şoreşgeran doza bingehîn hilweşandina kapîtalîzmê û li dewsa wê avakirina sosyalîzmê ye. Ji ber ku rehên hemû pirsgirêkan ji kapîtalîzmê şîn tên.
Kapîtalîzm di wateya xwe ya peyvê de serweriya resmal e. Weke ku di navê xwe de jî xuya ye kapîtalîzm xwe li ser keda karkeran ava dike. Amûrên hilberînê yên esasî di destê kapîtalîstan de kom dibe û di vê reşê de hemû kesên ku ne xwedî amûr in mecbûr dimînin ku keda xwe bifroşin kapîtalîstan. Karker di hilberînê de dibin hêza esasî ya hilberîner lê ji ber ku ne xwediyê berhemên keda xwe ne hêdî hêdî biyaniyê keda xwe û berhemên xwe dibin. Li aliyekî hejmareke mezin tevlî hilberîna civakî dibe li aliyê din jî kêmjimarek biçûk her ku diçe zengîn dibe.
Kesên kapîtalîst ji ber ku bi rêgeza fêdeya herî zêde tevdigerin di navbera xwe de jî hevrikiyê dikin. Pergala hilberînê ya kapîtalîst ne pêdiviyên gel fêdeya xwe esas digire. Ji ber van yekan dem deman di pergala kapîtalîst de qeyranên aborî derdikevin holê. Sermaye di nava hevrikiyê û qeyranan de têr û navendî dibe, yên mezin ên biçûk dadiqurtînin. Di van qeyranan de karker û kedkar hîn bêhtir xizan dibin û heyinên xwe yên biçuk bi lez winda dikin, rewşa wan a jiyankirinê hîn bêhtir xerab dibe. Hin ji van qeyranan weke qeyranên mezin ên heyamî derdikevin holê û dibin sedema guhertinên çawaniya şêwazê hilberînê yê sermayedariyê.
Sermayedariya hevrikî ya serbest digihêje mêtînkeriyê (emperyalîzmê).
Di asta neteweyî û cîhanî de yekdest (îhtîkar) derdikevin holê. Her ku kombûna sermayeyê zêde dibe leza belavbûna sermayeyê ya li cîhanê jî zêde dibe. Avakirina bazara cîhanî, yek ji meylên hundirîn ên sereke yê resmal e. Hevrikiya aborî ya di navbera yekdestan û welatên sermayedar de bi riya şerên parvekirinê yên dagirkerî û mêtîngeriyê vediguhere teşeya herî bilind a siyasî. Şer, encameke çarenîn a hevrikiya resmal e. Di van şeran de hêzên yekdestî ji bo berjewendî û ticareta xwe bi milyonan mirov qetil dikin, ji welatên xwe koçber dikin. Gel ji xaka xwe, ji dîroka xwe û ji hilberînê qut dikin û bi vê awayê wan dikin kesên ku pêdiviya wan bi alîkariyan



hene. Bi vê jî gel mehkûmî çanda kapîtalîst û parsekiyê dikin û di riya saziyên alîkariyê re gelê belengaz bikar tînin. Ango, êdî ji bo emperyalîstan cîhan hemû dibe yek bazar ji bo karkeran jî şerê li dijî emperyalîzmê dibe erka sereke ya şerê çînî.
Emperyalîzm, bi Şerê Yekemîn ê Parvekirina Emperyalîst hewil da ku qeyrana xwe derbas bike. Di vî şerî de li Rusya di pêşengtiya Partiya Komûnîst a ku Lenîn rêbertiya wê dike de şoreşa yekemîn a karkeran pêk hat. Şoreşa sosyalîst rê li ber firehbûna çavnebar a emperyalîzmê girt û ji gelên cîhanê re bû hêvî. Gelek welatên hatine mêtînkirin dest bi şerên azadiya neteweyî kirin û piraniya van welatan berê xwe dan avakirineke demokratîk an jî sosyalîst. Hêzên emperyalîst li ber vê pêşketina gelan formuleke bi navê dewleta civakî derxistin holê û xwestin ku bîrdariya karkeran gemar bikin. Li welatê xwe parek biçûk ji danehevên xwe yên mêtînger li karkeran belav kirin û hinek mafên demokratîk dan karkeran. Bi vê yekê xwestin ku mejî û birdariya karkeran gemar bikin û qaşo bidin xuyakirin ku ji bo pergaleke civakî sosyalîzm teqez ne pêwîst e û bi civaka sivîl mirov dikarin azadiya çînî bi dest bixin.
Emperyalîzm di salên 1975'î de dîsa ket qeyraneke gerdar. Di wê demê de li Sovyetan jî ji nû ve avakirineke kapîtalîst hebû. Van rewşên camîdi kir ku kapîtalîzm di nava xwe de şoreşa xwe ya dawî li dar bixe û derbasî asta kûrewîbûna emperyalîst bibe. Êdî kompanyayên yekdest bûn serwerê cîhanê. Ji bo yekdestan sînorên tîcaretê hatin rakirin. Dewletên ku bi navê civakîbûyinê alîkariya avakirina kapîtalîzmê dikirin bi lez veguherîn mêtîngehên malî û aborî. Sûkên neteweyî ji hilberîn û tîcreta cîhanî re hatin vekirin, baceyên gumrikê ji yekdestan re hema hema hatin rakirin. Hilberîn ji welatên Ewrûpayê ku cihê kapîtalîzmê xwe lê ava kiriye ber bi welatên mêtîngeh ve hatin veguhastin. Welatên emperyalîst veguherîn cihên ticaret û veguhastinê, welatên mêtîngeh jî veguherîn dojehên karkeran.
Emperyalîzm ji bo ku berjewendiyên xwe û heyinên xwe yên li welatên mêtîngeh biparêze zagonên navnetewî derxist. Di riya IMF, Bankeya Cîhanê, Yekîtiya Neteweyan, NATO û saziyên din ên cîhanî re jî ev zagonên xwe xist meriyetê û hêza parastina wan ava kir. Bi vî rengî êdî emperyalîzma bûye kûrewî hewil da ku hemû cîhanê bi rê ve bibe. Bi binketina revîzyonîzma Sovyetan êdî tu astengî li ber emperyalîzmê nemabû û bi lez li cîhanê belav bû. Bi vê re jî hêdî hêdî dest bi komkirina mafên demokratîk ku li welatên xwe dabûn karkeran kirin. Kapîtalîzmê bi binketina revîzyonîzmê li hemû cîhanê serweriya xwe ya bêdawî ragihand û ev yek veguherand şerekî mezin ê bîrdozî.
Ev pergal ji bo ku xwe domdar bike û ji nû ve ava bike bi hemû amûrên dewletê tevdigere. Hilberîn, têkiliyên hilberînê, dibistan, polîs, leşgerî, ragihandin, ol, çand, ehlaq, malbat û hemû nirxên din ên civakî li gorî têkiliyên kapîtalîzmê tên avakirin. Ev yek giştî ji bo domandina pergala kapîtalîst her kêlî êrîşî mejiyên karker, jin û ciwanan dikin. Pergala kapîtalîst ji bo ku yekîtiya civakê û karkeran hilweşîne bi rêxistinî û plansazî takekesîtî-xesîstiyê dike perwerde. Ji ber ku di pergala kapîtalîst de xwedî resmal tenê di fêdeya xwe de difikirin, civakê jî wiha saz dikin. Kapîtalîzm, ji bo fêdeya xwe ya zêde koletiya jinê ya hundirê malê û ya di kargehan de zêde dike. Civakê parçe dike û bê rêxistin dike. Mirov ji nirxên mirovahiyê dûr dixe û li şûna wê laşekî vala dihêle. Mirovê ku ji nirxên xwe hatiye qutkirin bi îmajê mijul dike, vediguherîne bireserên-objeyên mezaxtinê.
Pergala emperyalîst ji bo ku li hemû welatan bi hêsanî karibe tevbigere û xwe her ji nû ve saz bike dixwaze ku dewletên mêtîngeh lawaz bin. Ji ber vê yekê li cihên ku emperyalîst lê hebin pêwîst e qeyraneke siyasî-aborî hebe. Ger mirov hêviyê ji emperyalîstan bike ku li cihekî wê îstiqrarê ava bikin, ev şaş e. Berevajî vê ji bo ku karibin derbasî welatan bibin, bingeha wan a aborî bi dest bixin û serweriya welatan têxin destên xwe hêzên emperyalîst bi xwe bê îstiqrariyê ava dikin. Bi vê re hêzên çete ku li ser esasê mezheb, ol û neteweyan ava kirine û li dijî hêzên şoreşger bi kar anîne di vê demê de di asta cîhanî de dixwazin bi kar bînin. Têkiliyên Emerîka bi Talîban re, têkiliyên Tirkiyeyê bi DAÎŞ û hêzên din ên paşverû re, têkiliyên Rûsya bi Heşdî Şabî re mirov dikare mînak bide.
Şoreşa me ya Rojava, li hemberî vê pergalê jiyaneke demokratîk, gelparêz û azadîxwaziya jinê ava kir. Mafên rastî yên jin, karker, ciwan, netew, ol û xwezayê da. Ji ber vê yekê ye ku emperyalîzm bi gelek cureyan êrîşan bi ser şoreşa me ve tîne. Berdêla pergala kapîtalîzma hovane komunîzm e. Ji bo ku em karibin cîhaneke komunîst ava bikin pêwîst e em şoreşa xwe ya Rojava veguherînin şoreşeke sosyalîst û mirovên nû ku xwe ji gemara kapîtalîzmê rizgar kirine ava bikin da ku pêşengtiya vê guhertinê karibin bikin.

# فهم الرأسمالية ورفضها

الثورة مرفوضة ومطلوبة. لكي تكون قادرًا على رفض وضع التمويه الحالي ، من الضروري معرفة كيفية الانتقاد. الشيء الوحيد المهم في النقد هو تبادل المعرفة والرغبة. يحتاج الثوريون إلى تقييم الوضع الحالي بشكل إيجابي وإظهار الجوانب الإيجابية والسلبية. ثم حدد المكافأة ، واطلبها وحارب من أجلها.

في يومنا هذا ، يعتبر النقد والإطاحة بالرأسمالية أمرًا أساسيًا للثوار. يمكن للثوار أن يسلكوا طريق النضال حسب انتقاداتهم. بغض النظر عن الطريقة التي يذهبون بها ، لن يتمكنوا من قيادة ثورة اجتماعية حتى يحققوا الاشتراكية كهدف رئيسي لهم. المطلب الأساسي للثوريين اليوم هو الإطاحة بالرأسمالية وبناء الاشتراكية مكانها. لأن جذور كل المشاكل تأتي من الرأسمالية.

الرأسمالية هي سيادة رسمية بالمعنى الحرفي للكلمة. كما يوحي اسمها ، تبني الرأسمالية نفسها على عمل العمال. تتركز وسائل الإنتاج الأساسية في أيدي الرأسماليين ، وفي هذا اللون الأسود ، يُجبر كل من لا يملك الأدوات على بيع عملهم للرأسماليين. يصبح العاملون في الإنتاج القوة الإنتاجية الرئيسية ، لكن لأنهم لا يمتلكون منتجات عملهم ، فإنهم ينفصلون ببطء عن عملهم ومنتجاتهم. من ناحية ، ينخرط عدد كبير في الإنتاج الاجتماعي ، ومن ناحية أخرى ، يصبح عدد صغير أكثر ثراءً مع مرور الوقت.

على المستويين الوطني والعالمي ، تظهر الاحتكارات. مع زيادة تراكم رأس المال ، تزداد سرعة توزيع رأس المال في العالم أيضًا. يعد بناء السوق العالمية أحد الاتجاهات الداخلية الرئيسية للشكليات. يتحول التنافس الاقتصادي بين الاحتكارات والدول الرأسمالية إلى أعلى شكل سياسي من خلال حروب الاحتلال والاحتلال. الحرب هي النتيجة المصيرية للتنافس الرسمي. في هذه الحروب ، تقتل القوات الأحادية الملايين من الناس وتشريدهم من بلدانهم لمصلحتهم وتجارتهم. انقطع الناس عن أراضيهم وتاريخهم وإنتاجهم وبالتالي جعلهم أشخاصًا بحاجة إلى المساعدة. من خلال القيام بذلك ، فإن الناس يدينون ثقافة الرأسمالية ويتوسلون ويستخدمون الفقراء من خلال مؤسسات المساعدة. أي أنه بالنسبة للإمبرياليين ، أصبح العالم بأسره سوقًا واحدًا للعمال ، كما أن الحرب ضد الإمبريالية أصبحت المهمة الرئيسية للحرب الطبقية.

حاولت الإمبريالية ، مع حرب التقسيم الإمبريالية الأولى ، التغلب على أزمتها. حدثت الثورة العمالية الأولى في روسيا خلال الحزب الشيوعي بقيادة لينين. مهدت الثورة الاشتراكية الطريق أمام التوسع الهائل للإمبريالية وكانت مصدر أمل لشعوب العالم. لقد بدأ العديد من البلدان المحتلة حروب التحرير الوطني ومعظم هذه البلدان قد أعطت لنفسها بالفعل بنية ديمقراطية أو اشتراكية. في مواجهة هذا التطور الشعبي ، طورت القوى الإمبريالية صيغة تسمى دولة الرفاهية وسعت



إلى تآكل ذاكرة العمال. في وطنه قام بتوزيع جزء صغير من بياناته المعدنية على العمال ومنح العمال بعض الحقوق الديمقراطية. لقد أرادوا تقويض عقول وتطلعات العمال وتوضيح أن الاشتراكية ليست ضرورية تمامًا لنظام اجتماعي وأنه مع المجتمع المدني يمكن للناس تحقيق الحرية الطبقية.

دخلت الإمبريالية أزمة ضخمة مرة أخرى في عام 1975. كان هناك أيضًا إعادة بناء رأسمالية في الاتحاد السوفيتي في ذلك الوقت. مكنت هذه الظروف الرأسمالية من القيام بثورتها النهائية في داخلها والوصول إلى مستوى العمق الإمبريالي. تهيمن الشركات الاحتكارية الآن على العالم. تم رفع القيود التجارية عن الاحتكارات. الدول التي ساعدت في بناء الرأسمالية باسم التنشئة الاجتماعية تحولت بسرعة إلى مؤسسات مالية واقتصادية. فُتحت الأسواق الوطنية أمام الإنتاج والتجارة العالميين ، وألغيت الرسوم الجمركية تقريبًا من الاحتكارات. تم نقل المنتجات من الدول الأوروبية حيث تأسست الرأسمالية إلى دول التعدين. تحولت الدول الإمبريالية إلى أماكن للتجارة والنقل ، كما تحولت الدول الكبرى إلى جحيم للعمال.

سنت الإمبريالية قوانين دولية لحماية مصالحها وأصولها في البلدان المضيفة. من خلال صندوق النقد الدولي والبنك الدولي والأمم المتحدة وحلف الناتو والمنظمات الدولية الأخرى ، تم تطبيق هذه القوانين وحمايتها. بهذه الطريقة أصبحت الإمبريالية راسخة بعمق في محاولة حكم العالم بأسره. مع هزيمة التحريفية السوفيتية ، لم يعد هناك أي عقبة أمام الإمبريالية وسرعان ما انتشرت في جميع أنحاء العالم. وبهذا بدأوا أيضًا ببطء في جمع الحقوق الديمقراطية التي مُنحت للعمال في بلدانهم. أعلنت الرأسمالية هيمنتها اللانهائية على العالم كله بهزيمة التحريفية وتحول هذا إلى حرب أيديولوجية كبرى.

يعمل هذا النظام مع جميع أدوات الدولة للحفاظ على نفسها وإعادة بنائها. إن الإنتاج ، وعلاقات الإنتاج ، والمدارس ، والشرطة ، والجيش ، والاتصالات ، والدين ، والثقافة ، والأخلاق ، والأسرة ، وجميع القيم الاجتماعية الأخرى تُبنى وفقًا لعلاقات الرأسمالية. هذا بشكل عام يهاجم عقول العمال والنساء والشباب في جميع الأوقات من أجل الحفاظ على النظام الرأسمالي. ينظم النظام الرأسمالي التعليم والتخطيط الفرديين من أجل تدمير وحدة المجتمع والعمال. لأنه في النظام الرأسمالي ، يفكر المفكرون الرسميون فقط في مصلحتهم ، وكذلك المجتمع. الرأسمالية ، من أجل مصلحتها الخاصة ، تزيد من عبودية الإناث في المنزل ومكان العمل. يقسم المجتمع ويفككه. يتخلى الإنسان عن قيم الإنسانية ويترك جسدًا فارغًا بدلاً من ذلك. يتفاعل الشخص المنفصل عن قيمه مع الصورة ، ويحولها إلى كائنات موجهة.

ثورتنا في روج أفا ضد هذا النظام بنت حياة ديمقراطية شعبوية وتحرير المرأة. منح الحقوق الحقيقية للمرأة والعمال والشباب والأمة والدين والطبيعة. هذا هو السبب في أن الإمبريالية تشن العديد من الهجمات على ثورتنا. الشيوعية هي البديل عن النظام الرأسمالي الوحشي. لكي نتمكن من بناء عالم شيوعي ، نحتاج إلى تحويل ثورتنا في روج أفا إلى ثورة اشتراكية وبناء أشخاص جدد حرروا أنفسهم من براثن الرأسمالية ليكونوا قادرين على قيادة هذا التغيير.

# عاشت جمهورية كوردستان عاشت ثورة روج أفا

تم اعلان جمهورية كردستان في مهاباد في ٢٢ كانون الثاني (يناير) ٦٤٩١. تحتل جمهورية كوردستان مكاناً مهمة في تاريخ كوردستان. الأكراد حتى ذلك الوقت كانوا يقودون في الغالب من قبل القبائل والديانات ، بما في ذلك المتسولين وملاك الأراضي والشيوخ والشيوخ. استعمرت جمهورية كردستان تحت قيادة حزب ديمقراطي الكردستاني.

كانت دولة ديمقراطية وشعب مؤيد وأحرار

لقد كانت الجمهورية خطوة كبيرة في خدمة وحدة الأكراد ، وقدمت خدمات جليلة لكردستان خلال ١١ شهرًا من عمرها. أصبحت اللغة الكردية اللغة الرسمية ، وفتحت المدارس التي تستخدم اللغة الكردية كلغة التدريس. تقدمت القراءة والكتابة الكردية ، وتم إنشاء دور طباعة لنشر الكتب والمجلات والصحف الكردية. كان المسرح الكردي ممثلاً بشكل كبير. تم إنشاء محطة إذاعية. كانت هذه هي المرة الأولى التي يتم فيها إنشاء جيش لا يخضع لسيطرة القبائل والأديان وتأسيس جيش نظامي ، القوة العسكرية الكاملة لدولة كردية مستقلة. ولأنهم لم يكونوا من أصحاب العقارات والمشايخ ، فقد تمت الإشارة إلى شعب كردستان باسم البيشمركة. رفع علم كوردستان على سماء الجمهورية.

قال قائد الجمهورية قاضي محمد: "الأكراد يريدون فقط حقوقهم ، في تلقي التعليم بلغتهم الخاصة ، والاستفادة من موارد أراضيهم ، وامتلاك مبانيهم ومصانعهم. "الأكراد لا يريدون الاستيلاء على أراضي أي أمة".

لا توجد استيلاء كردية في أراضي أي أمة. لكن عيون الدول المحتلة والمحتلة كانت دائما على أرض كردستان. لسبب واحد ، لقد قمعوا الأكراد دائمًا ، ونهبوا مواردهم ، واستولوا على كل ثرواتهم. من أجل القضاء على فكرة كردستان الحرة ، يتم استخدام الإبادة الجماعية والنفي فحسب ، بل استخدمت أيضًا السيوف والسكاكين والمدافع والبنادق للقضاء على الكردية. تم حظر التحدث باللغة الكردية وقراءة وكتابة الثقافة والفنون الكردية والكردية والملابس الكردية والأغاني والقصائد الكردية والقصص والملاحم الكردية ولم يؤخذ تاريخهم في الاعتبار. أرادوا استيعاب الأكراد ، لأنهم سرقوا كل الثقافات والفنون الكردية ، وحولوها إلى حقيبتهم القومية العنصرية. كانت الدول الرأسمالية والإمبريالية متواطئة مع المحتلين في كل قمعهم للأكراد.

شكلت جمهورية كردستان نهضة جديدة في كسر سلسلة العبودية ضد كل سياسات القمع هذه. كان أتحاد السوفيات الاشتراكي وجمهورية كردستان على علاقة صداقة ودعم. لقد أمرت الدولتان الدكتاتورية والإمبريالية بهذا الإحياء الجديد وتعاونت مقاربة الأكراد للاشتراكية وأطاحت بجمهورية كردستان. تم تدمير كردستان بشكل وحشي مرة أخرى على يد الدولة الإيرانية الديكتاتورية ، التي حظيت بدعم الإمبرياليين. اغتيل قاضي محمد وغيره من القادة الذين قاتلوا من أجل كردستان الحرة.

اليوم ، غرب كردستان هو استمرار لجمهورية كردستان. لو كان الأكراد قادرين على تشكيل جمهورية واحدة لما أمكن الإطاحة بها بسهولة. لسوء الحظ ، لطالما كانت القبلية واللاعرقية أصل الشجرة الكردية. ماذا يجب أن يكون اليوم يجب ألا نسمح لثورة روج أفا بالانهيار ،ولا يجب أن نسمح لثورتنا المؤيدة للديمقراطية بأن تقع في أيدي القبائل والأراضي والأغنياء ، ولا يجب أن نسمح لسقوط ثورة النساء وازدهار النظام الأبوي ، يجب ألا نسمح بذلك إن ثورة شعوب الشرق الأوسط تسقط في براثن الرأسماليين الدكتاتوريين والإمبرياليين. لم تعد الثورة في روج أفا مجرد ثورة للأكراد ، إنها ثورة العرب والآشوريين والسوريين والأرمن وكل الشعوب الأخرى التي تعيش في شمال وشرق سوريا. الثورة اليوم في خطر كبير. يريد محتلو تركيا وسوريا الإطاحة بالثورة ، وخاصة الولايات المتحدة والدول الإمبريالية التي تحاول اقتلاع الحكم الذاتي الثوري الذي يريدو ان يتجه إلى الرأسمالية. كما قال قاضي محمد ، الأكراد لا يريدون احتلال أراضي أي أمة ، لكن يجب أن يعلم الجميع أننا لن نترك أيًا من أراضي ثورتنا للغزاة. يجب أن نصبح واحدًا ولا نذهب واحدًا تلو الآخر. دعونا نعمل معا من أجل إحياء جديد لكردستان وتحرير كل المضطهدين والحياة الجديدة التي نبنيها في روج أفا من خلال البناء نحو الاشتراكية ونشرها في الأجزاء الأربعة من كردستان والشرق الأوسط. بهذه الطريقة فقط يمكن أن تستمر ثورتنا في روج أفا. علينا أن نخرج ونحمي ونبني وننتشر ونتقدم نحو الاشتراكية.

PMLK - كوردستان

٢٠٢/١٠/٢٢٢

# Ji bo azadiya xwe li hemberî zilamperestiyê şer bike!

***'Ev rê ne bi gulan bi stiriyan tijî ye. Tenê yên ku di dilen xwe de derde dinyayê dikişinin xwedî wêrekiyê ne ku di vê riyê de bimeşin.' (Sampal Pal Devr)***

Ev gotin ya Sampal Pal e ku yek ji avakerên Çeteya Penbe ye û li Hindistanê ji sala 2014'an û vir de li hemberî tundiya zilaman xweparastina jinan pêş dixe û derdora 400 hezar endamên wê yên çalak hene. Weke ku Sampal Pal got jinan riyên bi stirî bi wêrekî derbas kirin, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şoreş çêkirin. Şoreşa Rojava jinan pêk anîn wê jin biparêzin.

Bi rêxistinên xwe yên xweparastinê, bi saziyên me yên ku avakirina civakî didomînin, ji kedkarên perwerde, tendirustî û malê bigire heta bi karkerên çandinî û kargehan, bi kedkarên me yên hunerê, bi xwendekarên me û hemû jinên ku jiyanê hildiberînin, hevserokên me yên jin, siyasetmedarên jin, fermandarên jin û bi şervanên xwe em ji jinên cîhanê re dibin çavkaniya berxwedan û hêviyê.

**Seferberiya Rêxistinbûnê!**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeya ku di cîhanê de di xweparastina jinê de mînakeke herî girîng e em ber bi 8'ê Adareke nû ve diçin. Hûn amade ne ku bi sed hezaran bi milyonan di 8'ê Adara 2022'an de kolanan dagirin û dengekî ji Rojava jî bidin berxwedan û têkoşînên azadiya jinên cîhanê. Weke jinên wêrek ên şerekî ku me heq girtiye ku bibin yek ji welatên edaleta jinê, gelo hûn dipejirînin ku serdema buharê ku bi 8'ê Adarê dest pê dike bi seferberiyeke nû ya rêxistinbûnê û asteke nû ya têkoşînê pêşvazî bikin?

Jibîrkirin her dem wê me bikişîne dubarekirinê. Ger ku em zêde ji bîr bikin şer wê her vegere. Dema ku mijar Rêveberiya me ya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Şoreşa Rojava bibe dîroka xwe, êşên xwe, hêsrên xwe, xwîna me ya ku rijiyaye em ji bîr nekin. Wekî jin em li berdêlên ku gelên me û jinan dane, li kedên ku me ji bo maf û azadiyên xwe dane xwedî derbikevin. Jibîrkirin tê wateya rehetiyê, nerêxistinbûnê, di her qadên jiyanê de û li hemberî şerên ku pêk werin mezinnekirina xweparastinê. Xwekişandina malê ji saziyên şoreşa me, ji kolanan, ji qadan, ji eniyên şer dûrketin e. Em ê jin, bi zanebûna ku jibîrkirin hevnirxê îxanetê ye mal bi mal, kolan bi kolan, enî enî bi rêxistin bibin. Li şoreşa xwe em ê jineke tenê jî bê rêxistin nehêlin. Em ê hemû hêzên dijminê şoreşa me û serdestiya zilamperestiya ku li ser jinan zextê ava dike têk bibin.

**Li hemberî êrîşên dagirkeriyê em şerê jinan xurt bikin!**

Dijminên me li benda fersenda ne. Êrîşa DAÎŞ'ê ya li ser Hepsa Sînaa ya li Hesekê ev careke din nîşanî me da. Çeteyên weke DAÎŞ'ê dewleta Tirk a burjuvayî ku hesabên wê yên dagirkirin û mêtînkirinê qet xelas nabin, Rejîma BAAS'î ku şoreşa me û rêveberiya xweser napejirîne û dixwaze ku hilweşîne li ser rêveberiya me ya xweser hîna metirsî û gefên mezin in. Herêmên ku li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya azadîxwaziya jinê dijminahiyê dikin qadên ku faşîzm, paşverûtî, zilamperestî lê tên hilberîn in. Efrîn, Girê Spî, Serê Kaniyê em ê vegerînin û jinan azad bikin.

Jinên pêşeng ên serhildana gelên Sûdanê ya 2019'an ji dêvla biwêja 'Cihê jinê mala xwe ye' dirûşma 'Cihê jinê şoreş e' bijartin. Erê, em jî di 10'emîn sala şoreşa xwe de, di van rojên ku em ber bi 8'ê Adarê ve diçin de bêjeya jinên Sûdanî dubare dikin: Cihê jinê ne mala xwe ye cihê jinê şoreş e!



Şoreşa me ya jinê, bi YPJ'ê re, bi rêxistinên jinan ên hêzên ewlekariya hundirîn re, bi komînên tax û bajaran û meclîsan nêzîkî serkeftinê bû, parastina van eniyan weke eniyên me yên azadiyê erka me ya herî bingehîn e.

Em ji bo zêdekirina jinên ku perwerdeya çek girtine û jinên ku di nobetên kolanan de cih girtine, ji bo li hemberî êrîşên dijmin eniyên jinan ava bikin û ji êrîşkaran hesab bipirsin sefer bibin.

Bi meş, mitîng, merasîmên şehîdan ên girseyî em derkevin pêşiya êrîşên dijmin. Em li meclîs û komînên ku rêxistinên me nexwedî derkevin. Em li her derê berxwedanê bilind bikin.

**Em rê nedin tundiya zilaman!**

Pirsgirêkek din a girîng jî hişmediya zilamperest a ku didome ye. Li hemberî zilamên ku hewil didin jinê bi malê ve girêdin, dixwazin qeydan li lingên me bixin em mecbûr în ku têkoşîneke hîna bihêztir bimeşînin. Erkên weke karên malê, nêrîna zarokan ne yên jinan in. Berpirsiyariyên hevbeş yên mirovên jiyanê bi hev re par ve dikin in. Em rê nedin ku zilam ji berpirsiyariyên xwe birevin, keda me mêtîn bikin.

